

## Pir girîng e mirov sporê bike di dema Korona de

**Divê tîmên sporê dîsa ji nûve dest bi perwerdehiyê û lîstikê bikin. Û her kesî ji 70 salî mestir dikare li derve jî sporê bikin. Lê tenê heke hûn şopandina şîreta Desteya Tenduristiya Gel bidomînin.**

Ji her temenî girîng e ku sporê bikin. Zarok û ciwan dikarbûn sporê bikin di dema krîza Corona-yê de. Lê wan bi renek cûda lîstiyê ku pir kes bi hev re kom nebin. Mezinên ku di tîmên cûda yên sporê de lîstin û pêşbazî nekirin.

Naha Desteya Tenduristiya Gel biryar daye ku hemî tîmên sporê ji 14-ê hezîranê dîsa pêşbaziyê bikin. Lê tenê heger hûn rêzikan bişopînin da ku enfeksiyonê belav nebe.

Federasyona Sporê ya Neteweyî çend pêşniyarên li ser çawa kêmkirina belavbûna enfeksiyonê dan pêşî. Hin pêşniyarên wiha ne: Tenê hûn dikrin ji hev nêzîk bibin dema ku hewceye têkiliyek nêzîk ji bo sporê. Li mal bimînin heger nîşanên nexweşiyê li ser hebin.

### Û divê cemawer tune bin.

Desteya Tenduristiya Gel dibêje ku xetera herî mezin ji belavbûna enfeksiyonê dema ku ew teng dibê, û gel tê de beşdar dibe. Ji

ber vê yekê, wan ji rêxistin û komeleyan xwestine ku alîgirên xwe re bêjin ku ji bo qedexeyan bişopînin. Heger ew wisa nekin divê ku tîm dîsa lîstikê qedexe bike.

Di navbera tîmên elît (elit-lag) û tîmên amator (amatör-lag) de cûdahî heye. Tîmên elîtan (elit-lag) heger pêwîst be rêwîtiyê dikin. Divê tîmên din waha nekin. Ew dikarin tenê 1-2 sat ji malê dûr bê. Wê hingê hûn dikarin zû biçin malê eger hûn nexweş bibin.

### 70+ salî jî divê sporê bikin

Dîsa yê ku 70+ salî ne (her kesê ku 70 salî û mezintir e) ew hewce ne ku derkevin û sporê bikin. Li Swêdê wekî gelek welatên din karantîn tune. Di şûna wan de, divê em fermanên Desteya Tenduristiya Gel bişopînin.

Ji ber vê yekê, her kesê ku 70+ ye dikare meşên dirêj bimeşe, an bileyîze bi croquet (krocket) an tiştê ku hûn hezîkin li derveyî mal bikin. Lê neçar e ku hûn jî hevûdu dûr bin.

Li derveyî mal, hûn dikarin yek an çend hevalên xwe re hevdîtinê bikin. Lê wê hingê divê ku hûn jî hevûdu dûr bigirin li cihên ku demê gelek mirovên din jî pir tune ne. Heke hûn hûrdek bimînin hûn bi hevaleyê an du heval re pîknîk bibin.

- Ger hûn şîreta bişopînin, xeter piçûk dibin, û paşê qezencên sporê dihesibînin, dibêje Johan Carlsson, rêveberê giştî yê Desteya Tenduristiya Gel.



Tevkariya krîzê wîlayeta Kalmar, tevkariyek di navbera hemû şaredarên wîlayetê ye, Navçeya wîlayeta Kalmar, Desteya Rêvebiriye wîlayeta Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de hene.



facebook.com/krissamverkan.kalmar

Kalmar kommun

